Dûv re , serokê P.Y.D.K.s mamoste Isma'îl Umer , gotina xwe pêşkêşkir. Di gotina xwe de , sedemên girtina sekretêrê P.Y.D.K.s û encamên girtinê diyarkir . Di vî warî de weha got : **Wan xwast, bi girtina hevalê Şêx tirsekê têxin dilên hevalên wî û namakê ji Tevgera Kurd û Niştimanî re bi rê bikin** . Lê bi girtinê negihiştin armancên xwe , ji dêvla wê herçû pileya xebata hevalan bilind bû û hêzên bira çi Kurd , Ereb û çi Aşûr piştgiriya xwe zêdekirin . Herweha mamoste Isma'îl domand û got : Girtina hevalê Şêx berhevhatina T.K û T. N zêdekir . Û got : **Ciyê gelê Kurd ne hepis û zîndan in , ew hêjayî jiyaneke xweş û geş bijîn , û tucarî pirsa gelê Kurd bi hepis û zîndan û girtinê çareser nabe** . Piştre gotina mamoste **Mustefa Cuma** sekretêrê Partiya Azadî ya Kurd Li Sûriyê hat . Di gotina xwe de birêz Cuma da xuyan ku , **pirsa gelê Kurd li Sûriyê pirsa milet û axê ye** , pêwîste jaliyê Tevgera Kurd ve , li ser bingeheke rast û durist were zelalkirin û mijayî nemîne . Li dawiyê sekretêrê P.Y.D.K.s mamoste Şêx Alî gotina xwe weha pêşkêş kir : **Silav û sipasî ji hemî piştgirên Tevgera Kurdî û niştimanî de bigir û ta hemî kes û komeleyên mafên mirovan û yên sêvîl , bi taybetî jî (Imnistî**) . Paşê jî silav ji **nemirên xebat û peyva azad mîna Dr.Nûredîn Zaza , Osman Sebrî , Hemzê Niwêran , Kenan Egît , Yusof Elezme , Ehmed Baravî , Ibrahîm Henano , Ebdirehman Osman , Ebdilhemîd Zîbarî û Ebdî Ne'san** , û H.W.D re rêkirin . Di nav re , li ser hebûna gelê Kurd ya dîrokî û erdnigarî sekinî û xuyakir ku Kurd ne koçber in Û. got em Kurd di vî welatî de hevpişkin

, Lidawiyê, gotina xwe bi, azadî , wekhevî , aştî û çaresekirina pirsa Kurd , na ji şovenîzmê re , na ji zulim û zorê re qedand . Weha jî vastîval bi dawî bû.

Di bin konê xêrhatin û azadiyê de, hevalê Şêx bi awakî fermî pêşwaziya şandên xêrhatinê ji aliyê hevalên P-Y ji hemî herêman, partiyên dî çi Kurd, Ereb , komonîst , mal û malbetên Kurd û cîran û dostên xwe yên Ereb dikir .

Hertim wî digote tevan, em ne poşmam in , em ji riya xwe namînin , gelê Kurd li Sûriyê ji paş tu sînoran nehatiye , ew xwedî xak û erd û ziman e , pirsa me pirseke rêzanî ye û li Sûriyê wê çareser bibe , Divê zimanê me neyê pişaftin , zimanê Kurdî ji yê Erebî , Farisî û Turkî ne kêmtir e , Sûriyê bi xêr be em bi xêr in û di vî welatî de mafên me rewan e . Ji ber wê divê dûr û nêzîk zanibin em Kurd pişikdar in jî. .

-weyî bi xêr vegerî nav me û gelê xwe hevalê Şêx Alî .

- Bijî gelê Kurd .

Memê Alan